

**TEVİ
HEMÛ
ZEHMETİYAN...**

Hezkirin!

**Masumi
Toyotome**

Müjde Yayıncılık

Tevî fiemû zefimetiyan

Hezkirin!

Masumi Toyotome

Müjde Yayıncılık Ltd.Şti.
Vişne Sok. 4/11
Kadıköy-İstanbul

© *Müjde Yayıncılık Ltd. Şti.* ne

Navnîşana xwestinê

P.K. 8 Acıbadem

Kadıköy-İstanbul

Tel: (216) 349 85 29

E-Mail: gnmmujde@Superonline.com

ISBN 975-7889-15-6

1994 All Rights reserved

Kurtış Matbaa Ofset
İkitelli-İstanbul 2001

1. Destpêk: Sê Cûre Hezkirin

Hema bibêje li dinê, tu kesekî ku naxwaze jê bê heskirin tune. Hîsa ewlehî û têriya ji alî yekî ve heskirina me, bingeha ji yaneke dilges çêdike. Tevî vê, di mijarêñ hezkirinê û divê mirov çawa li hezkirinê bigere de, em pirr ne serwext in.

Hezkirin çi ye, ne çi ye ji me re bi awayekî ronî û zelal pir kêm hatiye ravekirin. Jimara kesên ku besdarî qurseke li ser hezkirinê hatibe dayin bûne, yan jî yên ku di vî warî de ji bo jê re alîkar be kitêbek xwendine jî ne pir in. Mijareke ji bo jiyanê ewende girîng û pêdivî, seyr e ku di warê perwerdeyî de jî hatiye îhmalkirin.

Herçend hinek bêjin cûreyên hezkirinê pirtirin jî, em bikêmanî dikarin bêjin sê cûreyên hezkirinê hene. Ger em li van her sê cûreyên hezkirinê bikolin, wan munâqeşe bikin, bêşik wê fêda wê hebe. Îcar dilgesiya şexsî jî, dikare girêdayî ji van her sê cûre hezkirinan li kîjanê tê gerîn be.

2. Cûreyê Hezkirinê yê “Ger”

Ez ji cûreyê yekê yê ji van her sê cûreyan re dibêjim, hezkirina cûreyê “ger.” Ev, ger em bersiva hin hêviyên diyar ên ku ji me têñ kirin bidin, hezkirina ku wê bidin me ye. “*Ger tu baş bî wê bavê te ji te hez bike.*”

“*Ger tu serketî bî û bibî kesekî girîng, ez ê ji te hez bikim.*” “*Ger weke zilamekî, tu tiştêñ ku ez ji te hêvî dikim pêk bînî, ez ê bibim mîrê te yê dilsoz.*” Cûreyê hezkirinê yê herî zêde ku mirov lê rast tê ev e û hin kes ji vê hezkirinê pê ve hezkirineke din nizanin. Ev, bi awayekî ronî hezkirineke bibedêl û girêdayî şertekî ye, ango bi şertê pêkanîna tiştekî di bedêla hezkirina yê hezdike pêk were, tê soz dayin. Ji aliyê sebeb û awayê xwe ve egoist e. Mebesta wê jî, qezenckirina tiştekî di bedêla hezkirinê de ye.

Li hezkirineke bi vî awayî, mirov dikare bi awayê xwe yê herî erzan û adî, di kovar, roman û filmêñ bêmistewa de rast bê. “*Ger tu daxwazêñ min pêk bînî, min razî bikî, ez ê ji te hez bikim.*” Piranî, bi taybetî jî kesêñ ciwan, nabînin ku hezkirina bedêla bi hêviya tetmînkirina daxwazêñ cinsî yêñ mirovê hemberê xwe yê/ya ku hêvî dikan wê jê bidestxin, hezkirineke adî ya ku nikare wan têr bike û di eslê xwe de ne hêjayî tu fedekariyekê ye.

Di Tewratê de nimûneyeke balkêş a vê cûre evînê heye. Amonê ku yek ji kurên Dawid pêxember e, ji xwişka xwe ya ji dêmariyê ya bedew û delal Tamarê hezkiriye û bi mahna nexweşiyê xwestiye ku bê oda wê û lê binêre. Rojekê wê dixe bersînga xwe û dibêje, “*Were bi min re razê, xwişka min.*” Lê ew bersiva wî dide û dibêje, “*Na, nabe birayê min, zorê li min meke... Tiştekî welê di nav gelê Musewî de nabe. Dînîtiyeke weha ku bênamûsî ye meke.*” Tevî hemû berxwedana keçikê, Ammon guh nadе lavakirinê wê. Ji ber ku ji Tamarê hîn xwirtir e, israr dike, û bi zorê dikeve ser dilê wê. Paşê jî hete ku karibû ji keçikê nefret kir. Nefreta wî ewende pirr bûbû ku, deh qatê hezkirina wî ya berê bû (*Tewrat: 1.Samuel 13:1-5*). Hezkirineke weha, ewende egoîst e ku ji bo her du aliyan jî wê gavê dikare ciyê xwe bi nefretê biguhere.

Gelek zewac jî, ji ber ku li ser vî esasê cûreyê hezkirinê yê “*ger*” hatiye avakirin, xera dibe bi cihêbûnê bidawî tê. Gelek caran bûk an zavayêñ ciwan, aşiqê rewşa hev a rasteqînnabin, aşiqê rewşa hev a sûnî, ya romantîk a mezinkirî ya katî dixin. Dema ku xeyalêñ mirov yek bi yek têk diçin û tiştêñ ku mirov ji hev dipê pêk nayêñ jî, hezkirina berê

dibe nefret. Tiştê herî xerabtir, ew jî rastiyek e ku, ji rewşeke weha her du alî jî ne berpirsiyar in. Ji ber ku her duyan jî, fikra ku wê hezkirineke ji ya cûreyê “ger” pê ve hebe, qet nanîne ser bîr û bala xwe jî. Heta carinan, hezkirina dê û bavan a zarokên wan ku weke hezkirina herî saf û paqij tê hesêb jî, ji vî cûreyê ger pê ve ne tiştekî din e. Berî bi çend salan xwekuştina xortekî li Tokyo di rûpelê pêşin ê rojnaman de cîh girtibû. Ji dema dibistana navîn de, heta ji rojên dibistana seretayî de, vî xortê ku ji bo bavê xwe kêfxweş bike dixwest îmtîhana ketina Zanîngeha Tokyoyê, ku pêşbaziyeke zor dixwest qezenc bike, pirrî xebitî bû, heta piştî dibistanê çûbû kursên amadeyiya zanîngehê jî, lê biserneketibû. Ji ber ku di rewşeke weha de nedixwest derkeve pêş bavê xwe, hinekî jî dixwest bîhna xwe fire bike û wexteke xweş derbas bike, heftiyekê çûbû germavên Hakoneyê.

Dema ku hate malê bi bavê xwe yê hêrsbûyî re rûbirû bû. Bavê wî got, “*Ma Di îmtihanê de biserneketina te têrê nedikir, te şerm nekir ku tu rabûyî ji bo kêfê çûyî Hakoneyê?*” û ew şermezar kir. Lawikê bersîva bavê xwe da û got, “*Ma bavo, gava ku navekê tu jî aciz bûbûyî, te negotibû ez hezdikim biçim Hakoneyê?*” Bavê ku nizanibû wê ji

vê yekê re êdî çi bibêje, lawê xwe bi lêxistinê bêkeys kir; lawikê jî wê şevê xurtûma gazê ya qawiçiq a ji dîwêr kişandî û bi sobê ve girêdayî bû, ji aliyê sobê ve derxist û xiste devê xwe, bi vî awayî kezeba xwe tija gaz kir û jiyana xwe bidawî anî. Rojnameyan ev xwekujî bitenê weke krîzeke sinirî nivîsîn. Bi ya min sedemê vê krîzê ev bû ku lawikî fêm nekiribû hezkirina bavê wî bi şertê bicihanîna hêviyên wî yên mezin ve girêdayîye.

Em hemû ji vê hezkirina cûreyê “ger” mezintir li heskirinekê digerin. Hebûna hezkirineke rasteqîn û zanebûna me ya ku em ê karibin wê li ku bibînin, rojekê weke ku vî xortî kir, gava ku em mecbûr man hilbijartinekê di navbera domandina jiyana xwe û dev jê berdana wê de bikin, dikare rolekî mezin bilîze.

3. Cûreyê hezkirinê yê “Çimkî”

Cûreyê hezkirinê yê duwem, ez ê bi “çimkî” binav bikim. Di rewşa hezkirineke weha de, ji ber ku kes “tiştek e” yan jî “xwediyê tiştekî ye” yan jî “tiştekî dike” jê tê hezkirin. Hezkirina kesekî din a jê, girêdayî sifet an şertekî ku xwediyê wî/wê ye. “Ez ji te hezdikim çimkî tu pir bedewî.” Ez ji te hezdikim

çimkî tu ji kesên din ewende cuda, ewende populer, ewende zengîn û ewende binavûdengî ku... “*Ez ji te hezdikim çimkî tu baweriyê didî min. Ez ji te hezdikim çimkî trambêleke te ya servekirî heye û tu min dibî ciyêن pirr xweş ên romantîk!*” Em dikarin hinekî jî bi bisirînekê henekê xwe bi van peyvên balkêş bikin. Lê em jî, ji kesekî din gellek caran ji ber meziyeteke wî ya ku mirov dibîne û dibe egera ku mirov jê hezbike yan jî ji ber ku ew kes hezkirina mirov bi awayekî qezenc dike, hez dikan.

Mirov dikare hezkirineke welê di ser cûreyê hezkirinê yê “*ger*” re bigre. Qezenckirina cûreyê hezkirinê yê “*ger*” dikare bibe barekî mezin û giran. Lê, ji ber ku mirov xwedyiyê meziyetekê ye, ji mirov were hezkirin ew tiştekî xweş e. Ger kesekîji mirov, ji ber ku mirov weke xwe ye hez bikira, ji bo bidestxistina hezkirinê mirov ewende xwe nedîwestand. Fikra ku di hebûna mirov de tiştinên ku dibin sebebê ji mirov hezkirinê hene, wê mirov rihet bikira. Lê, nedûr û nêzîk mirov ê bibîne ku ji mirov hezkirina bi vî rengî ji handana bidestxistina cûreyê hezkirinê yê “*ger*” ne cihê ye. Ji ber ku hezkirina mirovan a li hemberî hev a bi sedema ji ber mirov “*tiştek e*” mirov pirr bextewer dike û ji ber ku mirov li hissa bûyîna

mirovekî girîng ku hin bihin mezin dibe û bi vî awayî, ji ber mirov difikire ku wê hîn bêtir însan ji mirov hez bike, ji bo lêzêdekirina heyranêñ nû li heyranêñ heyî mirov cahdeke mezin dike. Ger mirovekî xwedî mezyetên jêhezkirinê ji yên mirov bêtir derkeve holê, mirov ê bitirse ku yên ji mirov hez dikin wê ji yê nûhatî bêtir hez bikin. Bi vî awayî wê rikeberî û qezenckirina bêdawî ya hezkirinê bikeve jiyanâ mirov. Zarokê biçûk ê malê, ji pitika nûbûyî diqehere. Xortek ji xortekî din ê xwediye trambêleke spehîtir diqehere. Jineke bimêr, ji sekretera mîrê xwe ya bedew û balkêş diqehere. Ma wê gavê Di hezkirineke weha de hissa ewlehiyê dikare bibe?

Incîl dibêje, “*Hezkirina hêzdar, tirsê diqewirêne*” (*Incîl: 1.Yuhanna 4:18*). Ev cûreyê hezkirinê yê “çimkî” nikare bibe hezkirineke bihêz û rasteqîn.

Du sedemên din ên cihê yên vî cûreyê hezkirinê yê “çimkî” hene ku bêbawerî û ewlehiyê jî bi xwe re tînin. Yekem, tirsa nebûna mirovekî wek yê ji mirov hezdike, difikire ku birastî jî mirov dikare jê hez bike. Du aliyêñ hemû kesan, mirovan hene: Yek ji van herdu aliyan yê ku mirov nîşanî kesen din dide, yê din jî, aliyê mirov ê ku bitenê mirov dizane ye. Eve mirovê ji bo veşartina vî aliyê xwe yê duwem ku

dikare bibe sedemê şikestina hêviyên kesên ku ji mirov hezdikin û bi tirsa ku wê mirov red bikin, mirov hertim - şiyar e.

Hisseke din a bêbaweriyê ya vê cûre hezkirinê jî, ew e ku li pêşerojê kesayetiya mirov dikare bê guhertin û tirsa êdî rojekê dibe ku ji mirov neyê hezkirinê ye. Li Japonya jineke ciwan a pirr bedew li avahiyek paqijiya ziwayî dixebite. Rojekê depo diteqe û ava germ serçav, dest û piyên wê dişewitîne. Serçavê wê ewende kirêt bûye ku dema li nexweş-xanê ye serçavê xwe her veşartiye û ji xeynî doktor destûr nedaye kesekî din ku li serçavê wê binêre. Dergîstiyê wê, nîşan xerakiriye û dev jê berdaye. Di wê nav re çend mehan derbas dibin, hete roja mirina wê jî, tevî ku li eynî bajarî rûdinên, dê û bavê wê jî nehatine sertêdana wê. Ji ber ku jê hezkirina wê, li ser esasê bedewiya wê bûye, ku di rojekê de wenda bûye. Gava ku bedewî nemaye hezkirin jî nemaye.

Piraniya hezkirinên di civata me de bi vî rengî ne û mirov di derheqê pêkanîna berdewamiya wê de dikeve şikê. Ger weha be, cûreyekî din ê hezkirinê yê ji van cuda heye gelo?

4. Cûreyê Hezkirinê yê “Tevî”

Cûreyê sêyemîn ê hezkirinê, cûreyek e ku ez wê bi “tevî” binav dikim. Ji ber ku ne bi şertekî ve girêdayî ye û ji ber ku li hemberî wê mirov tiştekî napê, ji cûreyê hezkirinê yê “ger” cihê ye. Ji ber ku ne girêdayî meziyetekе balkêş a kesê ku jê tê hezkirinê ye û hebûna vê yekê ji xwe re nake bingeh jî ne weke cûreyê hezkirinê yê “çimkî” ye. Di vî cûreyê hezkirinê yê sêyem de, ne ji ber ku kes tiştek e, tevî ku tişte ke jê tê hezkirin. Kes, dibe ku mirovê a herî kirêt, herî belengaz, herî hejar be û dema ku rûbirûyî vî cûreyê hezkirinê yê “tevî” bû, dîsa jî jê dikare bê hezkirin. Ne layiqê vê ye. Bi bidestxistina mewkiyekî baş, balkêş an jî dewlemend navê ku vê hezkirinê qezenc bike. Tevî kemasiyên wî, cahiltiya wî, xwiya wî ya nexweş an jî rabirdûya wî ya xirab weke ku heye, bi tevayî dikare jê bê hezkirin. Bi tevayî dikare weke mirovekî bêqîmet bê dîtin, lê dîsa jî weke kesekî girîng dikare jê bê hezkirin.

Cûreyê hezkirinê yê ku dilên me herî bi hesreta wê ye jî ev e. Ger hûn jê haydar bin an nebin jî, ev cûreyê hezkirinê ji we re ji xwarin, vexwarin, libas, mal, malbat, dewlemendî, serketin an navûdeng hîn girîngtir e. Gelo ez çawa dikarim vê bêjim? Bitenê îzna min bidin ez ê ji we pirsekê bikim. Di kurahiya

dilê we de ger hûn bifikiriyana ku li dinyê kesek guh li we nake û hûn bifikiriyana ku birastî jî li rûdinyê kesek ji we hez nake, we yê hezkirin û eleqeya xwe ya ji bo xwarin, libas, mal, malbat, dewlemendî, serketin û navdariyê wenda nekira? We yê ji xwe re “*Çi feyda jiyanê heye?*” negota, nepirsiya?

Niha, ji xwe re ferz bikin we bi kesê ku li rûdinyê we ji herkesî bêtir jê hez dikir re şerekî pirr xirab kiriye û hûn tê gihiştine ku wî bitenê ji bo berjeven-diya xwe ji we hez kiriye; wê dinya bi carekê re li ber çavên we reş nebûya û we yê negota xweziya ez rojek berî rojekê bimrama? Ger hûn bifikiriyana, we bigota ez li gorî xwe bextewer im û we jiyana xwe ya rojane bidomandana jî, ger hêviya we ya ku wê rojekê yekê derkeve û ji we birastî, jidil hez bike û we razî bike nebûya, we yê jiyana xwe ya mayî çawa bidomandana? Belbî jî hûn ê bêhêvî bûbûna û we yê bixwesta xwe bikuşta, an jî we yê dev ji hemû karûbarê xwe berda û we yê weke miriyekî zindî ev jiyana xwe bidomanda.

Îro sedemê domandina jiyana we ya ji ber ku kesek niha bi vî cûreyê hezkirinê yê “*teví*” ji we hez dike, yan jî hebûna hêviya we ya lêrasthatina hezkirineke bi vî cûreyî ye. Lê di civata ku em îro tê

de dijîn de, em nikarin hezkirineke weha ku me bi temamî têr bike, bibînin. Ji ber ku pêdiviya herkesî bi vê yekê heye û dîsa ji ber ku bi kesekî re zêde tuneye jî nikare bide kesekî din. Mirov hêvîdike ku kesekî nêzîkî mirov, yekî ku mirov jê hez dike vê hezkirinê bide mirov, lê ew kes jî eynî tiştî ji kesekî din hêvî dike. Li vê dinyayê mirov dikare hezkirinê, bitenê ji bo birçîbûna xwe hinekî bi derengî bixe, dilê xwe bibîjîne hezkirina dahatûyê û bi qasî dîtina ku çendî pêdiviya mirov pê heye bibîne, tam bike. Xela herî mezin, tunebûna hebûna pêdivîya vî cûreyê hezkirinê yê “tevî” ye.

5. Vî Cûreyê Hezkirinê yê “Tevî” Bitenê Mesîh Îsa Dikare Bide Mirov!

Di derheqêku ev cûre hezkirin bi awayekî bêqusûr û têrûtesel ji mirovayetiyê re ji alî Mesîh Îsa ve hatiye ravekirin, di Incîlê de mesajeke muhteşem heye. Mirovayetî bi hezar salan li benda vê hezkirinê mabû û nizanibû ku wê li ku karibe lê bigere jî. Xwedê, nişan da ku hesret û hêviya mirovan ne belheq e. Mesîh Îsayê ku ji wî bixwe bû, ji bo herkesî û ew ji bo hezkirina ku wan bi awayekî têrûtesel razî bike

bîne rûdinyayê şand. Bi hatina ïsa re, mirov, li ciyê ku bitenê di derheqê vê hezkirina bitemamî saf û paqij de fikra xwe bibêje, di dîroka dinyayê de cara ewil, ew dît û di dilê xwe de his kir.

Cûreyê hezkirina ku Mesîh ji me re ji ba Xwedê aniye ne cûreyê “ger” e. Xwedê ji me re nabêje, “Ger tu baweriya xwe bi Mesîh bînî ez ê ji te hez bikim.” Ew ji mirovan, bêyî ku cudatiyekê têxe nava yên baweriya xwe bi Mesîh anîne û yên nanîne hez dike. Ew nabêje, “Ger tu baş û xwedî exlaqekî xweş bî, tu biçî dêrê, alîkariyê bi yên xwedîyiê armancêن wan baş re bikî, tu pirtûkên dînî bixwînî, dua bikî yan bibî oldarekî baş ez ê ji te hez bikim.” Di hezkirina wî de tu cûreyêن “ger” tunene. Xwedê, mirov çawa be welê jê hez dike. Ger em hîn xirabtir bûna jî wê dîsa ewende ji mirov hez bikira. Ger em roj biroj xirabtir bûbûna û me serî hildana jî, wê dîsa bi wê hezkirina xwe ya bêqusûr ji mirov hez bikira. Ji me, ji bo ku ji me fêdeyekê bibîne hez nake. Şertek an tiştekî din ku em pêk bînin tuneye. Gelo ez dikarim vê yekê çawa îspat bikim? Mirina ïsa ya li ser xaçê îspata vê yekê ye. ïsayê ku “peyva” Xwedê bixwe ye (*Binêre, încîl: Yuhanna 1:1-8*) hate rûdinyê, jiyana xwe ji bo başiyê bi hemû însanan bike û hezkirinê

nîşanî wan bide domand û xwe, bi taybetî di ber jar û hejaran de fedâ kir. Bedelê xizmeta di ber kesên ku nikaribûn bi tu awayî qenciya wî lê vegeranda bi jiyana xwe da; ji ber ku bi nexweşan, hejaran, nexwendîyan, fahîşeyan, kesên li derveyî civatê mayî û yên wek wan re bû, herdem rexne lê hate kirin. Di encamê de, bi serîdanîneke tam a li ber Xwedê, ji bo gunehêî însanan li ser çarmîxê mir. Gava ku li ser çarmîxê can da jî, dîsa ji kesên ku ew kuştin hez kir û got, “Bavo li wan bibore ji ber ku ew nizanin çi dikin” (*İncîl: Luka 23:34*). Wek şandî Pavlos jî dibêje, “Xwedê heskirina xwe ya ji me bi vê îspat dike: Hê em gunehkar bûn Mesîh ji bo me mir.” (*Nama Romayıyan 5:8*). Ev hezkirin, bi hemû paqijiya xwe hezkirina rasteqîn a “tevî” ye.

Hezkirina Mesîh ne fikrek an îdeolojiyek e, delîlekî li ber çavan e. Ji me re bi tenê ne wek nimûneyeke ku berî duhezar sal hatiye dayîn, hezkirineke ku herkesê bixwaze dikare lê bibe xwedî. Mirina İsa ne wek ya herkesî bû. Xwedê Wî dîsa sax kir û Mesîh İsa îro sax e, di vê bîsta ku hûn hîn vê nivîsa di destê xwe de dixwînin jî pirr nêzîkî we ye û di rewşeke weha de ye ku dikare bi vî cûreyê hezkirinê yê “tevî” ji we hez bike û dixwaze vê bike.

Ger hûn bitenê bêjin, “Ez vê hezkirina Mesîh niha ji hertiştî bêtir dixwazim û ez ê wî, ez çawa me welê û bi nefsbîcûkî qebûl dikim” hûn ê bixwe bi awayekî eşkere bi tecrûbeya xwe karibin tê bighên.

6. Mesîh Îsa Çavkaniya Bitenê ye

Îro jî, Îsa Mesîhê ku çavkaniya bitenê ya vî cûreyê hezkirinê yê “tevî” ye, Rebê ku zindî li ser çarmîxê miriye bixwe ye. Bawermendên Mesîhî (ango, Xiris-tiyanên ji dil ên rasteqîn) jî ku her roj neçin ba Mesîh, vê hezkirinê teze teze jê negrin, ew jî ji yên din bêtir ne xwediyê vê hezkirinê ne. Çavkaniya ku ev çemê hezkirina saf tim jê diherike, Mesîh e. Di vê heyama nûjen a ku em tê de dijîn jî, cûreyekî weha yê hezkirinê di nav civata bawermendan de jî nikare bê afirandin. Civatên bawermend jî, wek kesên bawermendên Mesîh, ger vê hezkirinê her roj teze teze ji Mesîh negrin bi tu awayên din riyekte din a ku bibin xwediyê xwe û vê hezkirinê ji wan re tuneye.

Çima çavkaniya bitenê ya vê hezkirinê Mesîh e? Çima însan bêyî ku xwe bighînin Mesîh nikarin bibin xwediyê xwe û vî cûreyê hezkirinê? Ji ber ku kemasî û quşûrên herkesî, hewcedarî û daxwazên wan hene. Însan çendî bitemen, bihiş, têgihîştî, dewlemend an

jî bihêz be bila bibe, pêdiviya wî ya ku ji ûnsanê din tiştekî din bigre heye. Ji ber ku hîn jî wê rewşa wî ya heyî negihîştiye radeya ku wî razî bike. Kesê bi tevayî tekûz û bêkêmasî ye bitenê Xwedê ye. Ger weha nebüya, ew ê nebûna Xwedê, bibûna rihbereki din. Xwedê, afirander, îstîsna bitenê, bêkêmasiyê bitenê û hebûneke tekûz e. Bitenê pêdiviya Wî bi tu tiştekî tuneye. Pêdiviya Wî bi me an jî bi hezkirina me tuneye. Bitenê Ew dikare hete bi hetayê bide û tevî vê jî hîn wê karibe bêkêmasîbûn û kamiliya xwe bidomîne. Dîsa yê ku karibe ji mirovên din “tevî” kêmasiyê wan ên heyî, bêyî ku tu tiştekî li hemberî wê bixwaze, karibe ji wan hez bike jî bitenê ew e. Mirovek, dikare bêje qey ew ji kesen din an jî ji mirovayetiyê “tevî” ku nizanibe ew çi ne hez dike, lê gava lêkolîneke kûrûdûr li ser vê yekê bê kirin, wê derkeve holê ku ew esas di bedêla vê de tiştekî dipê û ji ber vê jî esil ew ji xwe hez dike. Di bin helwesta kesê wek ji kesekî ku weke xwe ye hezdike dike de, esil ezezî û menfaetperestî heye. Em ê li hêviya ku handana me bê ecibandin bin, an jî li hemberî vê hezkirinê em ê bixwazin tiştekî baş û her bimîne pêk bê. Ger hêviya me pêk neyê, handanên me yên hezkirinê wê di demeke kurt de bibin kîn, bêhêvîtî, xeyd û bidawî bênen. Hezkirina di nava mirovan de, weke ku em hez dikan xeyal bikin ne tiştekî saf û paqij e. Hezkirina Xwedê ya ku bi

alîkariya Mesîh gîhaştiye me, hîn jî hezkirina berdewam a bitenê û rasteqîn a “tevî” ye.

7. Hûn Dixwazin Bi Kîjan Cûreyê Hezkirinê Ji We Bê Hezkirin?

Niha hûn bûna, we yê bixwesta bi kîjan cûreyê hezkirinê ji van hersê cûreyanji webihata hezkirin? Herhal pirr kêm kes, li cûreyê hezkirinê yê “ger” digere. Ji ber ku hezkirineke bi vî cûreyî, handanek û zordaneke bêdawî divê. Wê gavê di destê me de du cûre hezkirin dimînin. Ji van hûn ê kîjanê hilbijêrin? Tercîhkirina weke cûreyê hezkirinê yê “Çimkî” ya gelekan, mirov şaş dike. Sedemên vê, bi vî awayî ji mirov hezkirin nefsa mirov hîn bilintir dike. Geryek “ji ber ku tiştek e” jê tê hezkirin, ev tê mana ku ew pirr baş e. Ev cûreyê hezkirinê dibe sedemê ku mirov xwe mezin bibîne. Ji aliyekî din ve, “tevî” ku mirov tiştek be an jî ne tiştek be ku ji mirov bê hezkirin jî gellekî nefsa mirov jî dişkêne. Xortek gava ku bêje, “Xweşdiviya min, tevî hemû kemasiyên te ez dixwazim bi te re bizewicim” wê çend keçen ku pêşniyaza wî ya hezkirinê qebûl bikin hebin? Lê Xwedê ji mirov re eynî weha dibêje. Xwedê, ji ber ku em tiştek in ji mirov hez nake, bitenê

her tişt, angó tevî hemû kêmasiyên mirov ji mirov hez dike. Em nikarin hezkirina wî qezenc bikin û heq bikin. Em tenê dikarin vê hezkirinê weke diyariyeke bitenê biserbestî hatibe dayin qebûl bikin.

Weke hûn jî dibînin, ev ne tercîhek e ku mirov karibe bi hêsanî bike. Bedelê ku mirov ji bo vê hezkirina ku ya herî mezin e divê bide, şikestina nefsa mirov û îtîrafkirina ku mirov ne layiqê vê hezkirinê ye. Ger ev bedel ji bo we zêde ne biha be û hûn çawa dibil bila bibin bi qebûlkirina vê hezkirinê ji Mesîh razî bin, hûn di nav kesên bisiûd de ne. Divê hûn vê aniha qebûl bikin.

Încîl weha dibêje, “*Xwedê heskirina xwe ya ji me bi vê îspat dike: Hê em gunehkar bûn Mesîh ji bo me mir.*” (*Binêre: Nama Romayıyan 5:8*). Erê xwedê ji me hez dike, lê mirov çawa dikare vê hezkirinê ji Xwedê bigire? Her tişt bi duayeke biçûk a di dilê we de dest pê dike: “*Ez sipas dikim, Xwedayê mezin, ez mirina Mesîh ê ku te şandibû weke bedelê gunehên xwe qebûl dikim. Herweha ji ber ku Tu ji min, ez çawa me weha hez dikî, ez jî hezkirina Te ez çawa me weha qebûl dikim.*” Dema ku hûn vê duayê bikin ji aliyê hissî ve hûn dikarin tiştekî his nekin an jî berevajiya wê di bin lehîyeke hissan de bifetisin.

Herdu jî rewşên tesadufî ne. Girîngiya hissan di plana dawiyê de dimîne. Tiştê herî girîng ew e ku, mirov bi tevayiya kesayetî û îradeya xwe, bi beden û hissên xwe, hiş jî tê de biryara xwe bide. Piştî ku we ev dua carekê kir, êdî tevî her tiştî bi dilekî rihet bawer bikin ku ji we tê hezkirin û jiyana xwe ya ji niha û bi şûn de li ser esasê ewlekariya ku Xwedê bitemamî û ji sedî sed bi rastî ji we hez dike, ava bikin.

Mana avakirina jiyana xwe ji seranû ve, nejiyana tasewas û bêewlehiya di jiyana xwe ya rojane de, zanebûna piştgiriya Xwedê û qebûla we ji alî Wî ve ye. Birastî jî tiştê girîng têkiliya bi kesekî re ye. Wê gavê êdî navê ku emjê bitirsin, bê ka mirovên din di derheqê mirov de çi difikirin. Ji bo pêşketinê navê ku em bi mirovên din re têkevin reqabeteke zor û sîtemkariyê li wan bikin. Ji bo ku mirov mafê xwe ji kesên din bistîne navê ku mirov hertim di rewşeke bêhuzûr de be. Ji bo debara xwe kirinê navê ku mirov têkeve xatebatê, ji ber ku êdî mirov di bin bazkê Xwedê de ye. Êdî navê ku mirov di xatebata ku mirov qencê Xwedê ye an na de bibîne. Ji ber ku Wî jixwe di rewşa me ya herî neqenc de jî ji mirov hez kiriye. Piştî ku mirov ji bo bi destxistina pêdiviyên xwe bi Xwedê ewle bû, divê mirov fikir û ramanên xwe,

malbata xwe, heval û civata xwe li ser esasê vî cûreyê hezkirinê yê “tevî”, ji nû ve rêkxe, baş bifikire. Ev jî delîlê ku mirov ev hezkirina saf û rasteqîn a “jîrîtiya hezkirina tevî hertiştî” ya mirovên ku mirov ew nû îkna kirine, ji Xwedê sitendiye ye.

“*Em hez dikan, ji ber ku berê wî ji me hez kir*” (*Încîl: 1. Yuhanna 4:10*). Mirovên ku berê mirov tucar li wan nediborî, mirov dikare li wan bibore, yên ku mirov ji wan nefret dikir jî mirov dikare ji wan hez bike. Ev yek nayê mana ku mirov bi carekê re dibe mirovê baş. Sedemên vê jî tijebûna dilê mirov a bi hezkirina wî ya ji alî Xwedê ve ye. Mirov dibelûleyên hezkirina xwedayî. Lûleyeke zingarî jî, dikare bêmexrûrî ava jiyanê biguhêze. Bi Xwedê re ketina têkiliyeke heskirinê ya weha û pêşkêşkirina xizmeteke tije evîn a mirovan, hesreta wê jiyana têr û tije ya ku me bêriya wê kirî, bi xwe ye.

8. Helwesta We Ya Li Hember Hezkirina Xwedê

Ger we ev hezkirina “tevî” ya ku bi kesayetiya Îsa Mesîh ji me re hatiye pêşkêşkirin, heta niha bizanebûn û bibiryardarî qebûl nekiriye, hûn

naxwazin niha wî qebûl bikin û duayeke bi sipasiyê
tije jê re bikin?

Ger we ev hezkirin berê ji Xwedê girtibe, êdî hûn
dixwazin xwe bikin goriyê mizgînguhêzê hezkirina
wî? Hûn dixwazin ji vê hezkirina Xwedê ji kesên
din re jî bahs bikin? Hûn dikarin ji kesekî, kî û çi
dibe bila bibe, bi navê Mesîh Îsa hez bikin? Niha li
yekî ku hûn wî nasd ikin bifikirin, ji bo hûn jê re ji vê
hezkirinê bahs bikin, an jî nîşanî wî bidin, hûn dikarin
xwe li ber Xwedê bikin gorî û duayeke bêdeng jê re
bikin?

KUPONÊ XWEDEVANAN

Xwendevanê hêja,

Ger weşana me bala we kişand an we jê îstîfade kir ev ê me pir memnûn bike. Hîn gellek kitêb û kitêbokên me yên wek vê hene. Ger hûn lîsteya pirtûkan an broşûra danasînê dixwazin, ji me re binivîsin. Ger pirsên we yên di derheqê baweriyê an mijarên girîng ên weke wê de hebin, em ê li hêviya nameyên we bin. Her xwendevanê me yê ku vê anketê dagire em ê jê re diyariyeke biçûk bişînin.

Anket-Ji kerema xwe çargoşeyên pêdivî destnîşan bikin.

1. We ziman û mijara kitêboka *Tevî hertiştî hezkirin* çawa dît?
 Hesan Navendî Zor
2. Temenê we? Ji 18 salî biçûktır 18-25 26-40 Ji 40-î mezintir
3. Rewşa we ya perwerdeyî? Seretayî Navendî Lîse Bilind
4. Zayenda we? Keç Mêr
5. Rewşa we ya medenî? Bekar Zewicî
6. Ez dixwazim hûn dersên kursa xwe ya Incîlê bêpere li ser navnîşana min rêkin? Erê Na
7. Ez dixwazim hûn lîsteya xwe ya pritûkan û broşura xwe ya danasînê liser navnîşana min bişînin. Erê Na

Nav, Nasnav:.....

Navnîşan:.....

Bajar:.....

Jî kerema xwe rûpelî jê bikin an fotokopiya
wî bikşînin û bişînin navnîşana:

P.K. 8 Acıbadem
Kadıköy - İstanbul

A

ezkirina rastîn û têrker
çi ye? Ma gelo di vê
dinya har, fanî û tevlihev
de hezkirina rastîn heye?

Bersîva vê pirsê “erê” ye!
Belê hezkirina rastîn bi
pirranî li dera ku mirov lê
digere nayê dîtin.

Ev kitibok hezkirina herî berz
û rastîn salix dide û bersîva
ku emê wê li ku derê bibînin
jî dide.

480-2970

ISBN 975-7889-15-6